

Tewfîq Wehbî

Bincî kurd û zimanekeyan

Govarî Korî Zanyarî Kurd, bergî dûhem, beşî dûhem, lapere 1-24. Bexdad 1974.

Tercemey le erebîyewe: Asos Şefîq, Stockholm, newrozî 2013.

Em berheme be elfbêy aramî:

https://komak.nu/Kurdi/Kteebkhane/KteebiKOMAK_PDF/TW_BinciKurduZimanekeyan.pdf

Mêjûnûsanî musilman le derawêkî efsanezadewe karyan legel dozî bincî kurd dekird leber eweşe tojînewey zorbeyan bayexêkî hizirî û mêjûkirdyan niye. Belam le serdemanî niwê û betaybet lem serdemey êmeda çend tojerêkî ewrûpayî peyda bûn, pêşemîyan dawê bem doze û zincîreyek tojîneweyeyan dest pê kirdûwe ke ta êstaş berdewame. Yek lewaney tojînewe û boçûnyan lem buwareda lay ême debêt mayey serinc bêt profîsor Vladimir Minorsky¹ -ye. Minorsky nûşyarêkî pêşkeş kird be *Korî Firemîllîy Rojhelatnasî* ke salî 1938 le Bruksel kobowe û têyda hate ser basî bincî kurd û gutî: *“Şirovekirdinî yekbûnî mîlletî kurd debêt bibirêtewe ser binemay madbûnyan”*. Paşan miştûmirî dirêjxayen le layen profîsor Minorsky û tojeranî dîke hate kayewe û ewey deyhewêt be asanî detwanêt beseryan bikatewe. Min lêreda lebirî dûbarekirdinewey ew basane wehay be dirustitir û girîngtir dezanim miştûmirî leser ew boçûnane bikem ke wirûjawin û larîyan heye le hevbendîy kurd û mad. Çünke ger lêman rûn bêtewe larîbûnekan leser belgey lawaz û hele helnirabin ewa debête piştîwanî lew bîrdozeyey serewe ke delêt: *“kurdî emro newey madin”* û xoyişim betewawî layengîrîm.

Berhelstîy here girîng lew bawere degerêtewe bo gutarêkî dr. D. N. MacKenzie^{II} ke le raportî salaney *Komeley Ziman* -î salî 1961 bilaw kirayewe be nawî *“Bincekanî zimanî kurdî”* û têyda MacKenzie berawirdkarî dekat le nêwan zimanî kurdî û zimane êranîye bawekan be zimanî farsîşewe. Em gutarey MacKenzie pişt debestêt be gutarêkî mamosta Tedesco^{III} be nawî *“Tojinîyewey zimanekî le deqî «Turfan» -î serbe zimangeli êranîy rojaway”*. Encamgîrîy em tojînewey delêt debêt wehay dabinêyn ke zimanî kurdî bertawî zimanî farsîy nêweraste ke serbe zimangeli başûrî rojaway Êran e. Herweha gumanî xoyişî derbirîwe lew bawerey Minorsky û tojeranî dîke ke delên zimanî kurdî serbe zimangeli rojaway Êran e, wate ew devere de debête niştimanî mêjûkirdî mad.

Bem coreş MacKenzie ew bîrokeye ret dekatewe ke delêt mad bapîranî kurdî em zemanen. Belam deşbêt bilêyn ke MacKenzie tewaw cêgîr nebû leser ew boçûney xoy û dîdekeşî tenha girîmane bû nek birdozeyekî selmênirawî dabiraw. Rastîyekeşî be dîdî min her emeye, MacKenzie - ke wanebêjî kurdî bû le SOAS^{IV} (Zankoy London bo Tojînewey Rojhelatî û Afrîkayî) - zimannasêkî nawdare wêray eweş min be pêwîstî dezanim peycorî bikirêt le dirustîy ew belgeyaney koy kirdûnetewe bo rastandinî girîmanekey xoy. Derfetî wirdbûnewe le kesayetîy kurdî emro û madekan be rûnî amaje deden be hêzî derikkirdinyan be yekbûnî mêjûkirdî xoyan û ewey birway bem hevbendîye hebêt galtey be destewajekanî MacKenzie dêt ke carûbar tund dêne berçaw. Eweta denûsêt:

Hewildanî kurdî hawçerx bo bedgîrî (îstîxlal) y mêjû hewilêkî gewcaneye mebest lêy xorahêzan û xoşaneweye. Emane hestyan kird pêwîste rîşey xoyan bernewe ser berebâkî xawen palewanetî û zanîşyan madî xawen seng û şiko, kes heta êsta bekarî nehênawin bo noreyekî weha, pêyan wabû çî herayek çê nabêt ger eman madekan bo ew mebestey xoyan bekar bihênin. Bem coreş rahatin bewey bigerênewe bo ewey nawyan lê na serdemî Mad û her ewendeşyan xercî lê kêşa ke jimarey 612 bixene ser mêjûy ême û bigene mêjûy ew saley Mad Neynewa -y têda dagîr kird. Ewca beranber em têkeley dakewtêkî kem û xeyalêkî zor, belgey zimanewanî girîngîy peyda kird.

Debêt bilêm le rastîda ewe kurd nebûn kewtinî Neynewa -yan kirde seretay serdem, ewe *Encumenî Êranolojîy Farsî* bû salî 612 BC weha nawzed kird.¹ Wêray ewey MacKenzie pêy wabû gewahîy mêtûkird bo peywestî mad û kurd birîtîye le “*têkeley dakewtêkî kem û xeyalêkî zor*” paşan hat û pêşanî da ke belge zimanewaniyekan girîngîy pejrândî ew peywesteyan helkişand.

Bêguman kosp heye dêne rêy biryardan le peywestêkî mêtûkirdî selmêndiraw belam ber lewey bêyne ser belgekarîye zimanewaniyekanî MacKenzie pêm başe yekêk le metelekanî mêtû bixeyne ber bas û çend çareserêkî şîyawî lê pêşniyaz bikem. Metelekeş emeye: erê mad çîyan beser hat?

Em nawçeyey dekwête bakûrî Îraqî êstewe le kotay sedey pêncemî pêş zayîn, le bakûrî çiyay Hemrîn -ewe be kenarî rojhelatî rûbarî Dîcile -da heta sinûrî welatî Kerdoxî le bakûr, beşêk bûwe le welatî Mad (birwane Zênofon^v: “Anabasis”).² Paşan le kotay sedey heftemî zayînewe nawî mîlletî Mad le nêw Êran -da xamoş debêt û çîdî nayete nasîn. Legel eweşda paşmawey mêtûkird heye amaje dedat bewey le kotay serdemî sasanekanda em nawî Mad -e be şêwazî dîkey wek *May* û *Mas* bûnî hebûwe. Tenanet le seretay serdemî îslamda ew nawe wek “Mah” hebûwe û le nawî dû nawçey “Mah el-kufe” û “Mah el-Bessre” bekar hatûwe.

Leweş bitirazêt paşmawey aramîy mesîhîyekan em naweyan heta kotay serdemî sasanekan, be şêwe bincîyekey xoy *Maday* parastûwe. Wişey *Madya* bo “nîştimanî mad” û *maday* bo “gelî mad” bekar dehêniran. Deysa çî rûy da û çî bûwe hoy sirînewey nawî em mîllete şikomende? Neşman bîstûwe karesatêk le serdemî sasanekanda rûy dabêt û Madî xapûr kirdibêt. Leber ewe pêm waye, gerçî nawî Mad le bîran sirayewe, belam aşkiraye madekan xoyan her berjiyanin û kurd newey madin.

Xêle kurde hîndo-ewrûpayî behêzekan letek xizime rewendekanî dîkeyan ke paşan awêteyan bûn, le dêrzemanewe bûbûne hereşe le welatî Mad. Mêtûnûsî yonanî Polybius (125-205 BC)^{vi} le *The Histories* da basî welatî Mad dekat û delêt:

Gîşt sinûrî şanişînî Mad dewre dira bû bew şare yonanîyaney paş dagîrkarîyekanî Eskender, bemebestî berbestin le derawsê kêwîyekan, binyat nirabûn.

Mêtûnûsî êranîş Hesên Pîrnya^{vii} pêman delêt: xêle çîyanişînekan le serdemî fermanrewayî Seleukos II Kallinikos (226-246 BC)^{viii} - da xawen qelay tokme bûn, nedehatine jêr rikêfî dewletî Yonan -ewe.

Le hemû mawey fermanrewayî Selukî, mîrî neytwanî ew xêle rewend û nîmçe rewendane bixate jêr rikêfî xoyewe. Paşan le serdemî cêgirewey Selukî - wate “Erşakî”^{ix} ke salî 226 -î zayînî deselate lawazekeyan kota bû - deselatî derebegî nawçeferman ziyadî kird û beweş xêle rewendekan zaltirbûn beser werzêr û cutyarda.

Leweşewe derdekewêt ke demew kotay fermanrewayî “Fertî”,^x gelî kurdî arî destî beser çiyakanî welatî Mad -da girtibêt. Bo kesanêk le xulyay em basaneda bin, em diyardeye rûnî dekatewe boçî yekem hêrişî yekem şay sasanekan: Erdeşîr-î Pabek^{xi} (226-241) -î zayînî bo dagîrkirdinî welatî Mad bûwe. Ewey pêy degutirêt *Karnameg î Erdeşîr-î Pabek*^{xii} ke leşkirkêşîyekanî Erdeşîr le têkeleyekî dîrok

¹ محمد جواد مشكور، تاريخ ايران باستان على رواية ابن العربي، طهران، 1947، ص 29.
Muhemmed Cewad Meşkûr. Tarîx Îran bastan - ela rîwayet îbin el-îbirî, Tehran, 1947, s 29.

² Herweha birwane nexşey lapere 14, Rex Warner, *The Persian Expedition*, 1957.

û efsaneda tomar dekat, berûnî pêşanî dedat ke herdû nawî *masî* - ke her dekatewe *madî* - û kurd³ nawî yek mîlletin. Her nebêt layenî kem ew bare weha bû heta kotay sedey şeşem, ke be mêjûy *Karnameg* danirawe.

Karnameg wirdekarîy hêrişî Erdeşîr bo ser madekan be zimanî pehlewî tomar dekat û delêt:

Erdeşîr paş ewey Erdewan -î pêncem dekujêt ke şay fertî [partîyan, eşkanî] -yekan bû, leşkirêkî gewrey le "Zabil" [Zabul] şetek da û çûwe cengî "kurdan şahî Masî" - [kurdan şahî Mad].

(beşî 1-5)

Her lew beşeda *Karnameg* delêt:

Leşkirî Mad pêy wabû rizgarî bûwe le leşkirî Erdeşîr ke şikestî hênawe û berew welatî fars paşekişey kirdûwe.

Çîrokeke berdewam debêt û delêt:

Belam Erdeşîr be çîwar hezar piyawî amadewe le nakaw pelamarî "madekan" -î da û hezar piyawî le kurdekan kuşt û ewaney dîkey birîndar û bezîwî be dîl girt û le samanî kurdekan zorî be talan bird.

(beşî 11-5-9).

Kewate em ragiwastaney serewe pêşanî deden ke nûserî *Karnameg* - ke le kotay sedey şeşemî zayînîda jiyawe - her wek basman kird, *mad* û *kurd* -î be yek gel danawe.

Herweha kitêbêkî dîkey mêjû heye be zimanî aramî bas le Hewlêr dekat û le sedey pêncemî zayînîda nûsirawe, delêt:

Şahpûrî yekemî şay sasan le yekem salî fermanrewayî xoyda pelamarî made çiyanişînekanî da û salî 42 BC, le cengêkî diwarda zal bû beseryanda.

Bêguman ew made çiyanişîne her debêt kurd bin.

Ew nawçeyey kurd xoy têda sepand her ewe bû ke êsta pêy degutirêt Kurdistan be firewantirîn watay ew çemikewe. Belam kurd xoy beser gişt welatî Mad -da neseband, beşêk lew nawçeyey pêy degutirêt bakûrî Azerbaycan bûne turk. Nawçey dîkey bakûrî rojaway kenarî deryay Qezwîn û herweha nawendî Êran, be kurdî nawzed nekirawe gerçî şêwezar hen lem nawçane deçûnewe ser "zimanî kirmancî". Belam nawî kurd le zor nawçe nawî *mad* û nawî xêle arîyekanî dîkey le amêz girt.

³ Nawî kurd le *Karnameg* -da be «t» î pehlewî nûsirawe nek be «d».

Be dîdî min nawî *mad* pêçirayewe û nawî *kurd* cêy girtewe her bew corey le Frensa nawî *fereng* cêy nawî *gal*^{xiii} -î girtewe.⁴ Eweşiman le la rûn nîye paş xamoşbûnî nawî *mad* rêk key nawî *kurd* cuda kirayewe le nawî danîştwanî *kirmanc* -î şarnişîn û gundnişîn. Ew kurdey xoy be *kurd* nawzed dekind, be xelkî nîştécêy degut *kirmanc*. Paşan ew nawe le nêw mîlleteke xoşîda hate bekar hênan û ewanîş be xoyan degut *kirmanc*.

Belam *zaza* be xoyan delên *kurd* û be *kirmanc* îş delên *kirdasî*.⁵ Dûr nîye paşgirî “asî” le “asa” we wergrêbêt û ger weha bêt dekatewe “be şêwazî kurdî” (ewey *kurd* lay başe - *kurdpesend*). Lem serdemaneda, le nawçekanî Soran û Mukirî be gundnişîn degutirêt *kirmanc* belam ew nawe lay şarnişîn û le nêw xêlanda be watay “*kesî wabestey zewîy xawendar*” dêt. Belam danîştwanî nawçey Kurdistan -î Êran, mebestim nawçey Sine -ye, û herweha nawçey Xaneqîn / Xaneqî be xelkî dîkey na “*goran*” -î nawçekanî rojawa û bakûr delên *kirmanc*. Belam danîştwanî Suleymanî û Kerkûk em naweyan feramoş kirdûwe gerçî ewey lewê *goran* nîye bêguman *kirmanc* -e. Emaney nawî *kirmanc* -yan feramoş kirdûwe be gundnişîn delên *miskên* (wabestey zewî) û dîrîş nîye le “mes / mad” ewe wergrêbêt.

Kurdî bakûrî Zêy Gewre be xoyan delên *kirmanc* û be zimanekey xoşyan delên *kirmancî*. Cêy xoyetî lêreda bilêyn şaîrî gewrey *kurd*, Ehmedî Xanî, nûserî kitêbî *Mem û Zîn* derbarey beserhatî palewanan (salî 1693), ke be zimanî kirmancîy jûrû nûsîwiyetî, nawî “*kurd*” û “*kirmanc*” -î be cêgorkê û be nore bekar hênawe. Be nimûne:

Da xelq-i nebêjîtin ku Ekrad
Bê me`rifet in, bê esl û binyad

Bifikir ji ereb heta ve gurcan
Kirmancî ye bûye şubhê burcan

Le Kurdistan nawî *kurd* cêy nawî *kirmanc* -î girtewe û bedem ew gorankarîye civakî û zimanekeyewe, wişey *kirmancî* ma û terxan kira bo şêwezare here gewrekey kurdî. Em şêwezare here gewreyey kurdî sê şarêçkey lê debêtewe:

- Kirmancîy jûrû: bayezîdî, hekarî, botanî, aşînî, badînî, orfeyî... htd.
- Kirmancîy nêwend: soranî, mukirî, suleymânî, sineyî...
- Kirmancîy jêrû: kelhurî, lekî, piştguhî...

Sinûrî kirmancîy jûrû legel kirmancîy nêwend le nêzîkey kenarî başûrî *deryaçey Wirmê* we dêt heta nêzîktirîn xalî zêy gewre û lewêşewe legel rêjewî^{xiv} rûbareke deçêt heta degate rêjgey^{xv} xoy. Sinûrî nêwan kirmancîy nêwend û kirmancîy jêrû le nêzîk bakûrî Kirmaşanewe dêt bo Xaneqîn û Qeşiqe (çiyay Hemrîn).

⁴ Birwane ew dû gutarey le govarî *Gelawêj* -da bilawim kirdûnetewe: jimare 2 û 3, Bexdad, salî 1940. Lewêda basim le pêçiranewey nawî *mad* kirdûwe le nêw nawî *kurd* -da.

⁵ Birwane: Kemal Badilli. *Kürtçe gramer*, lapere 216.

Lêreda basî dabeşînî şêwezarekan bo rûnkirdinewey ew heleye hat ke beşêk le şêwezare nasoranîyekan be soranî dadenêt. Em babeteşim le gutarêkda be nawî *“Derbarey şêwezare kurdîyekan”* bas kirdûwe - birwane: Gelawêj, jimare 4, bexdad, mangî nîsanî salî 1940. Beweş min yekem kes bûm lew govareda, le sinûrî ciyografîy şêwezare kurdîyekanî tojîbêtewe.

Ewca ba bigerênewe bo basekey MacKenzie, nûsîwyetî:

Le rastîda take amajey aşkira derbarey kurd lay nûsere dêrînekanî ber lem zemaney ême, yek bedûwa yekda birîtîye le Polybius, Livi û Strabo^{xvi} ke basî “kurtî” deken, dû mêjûnûsî yekem delên: “Emane tenha cengawerî yedegî rimhawêj bûn le nêw leşkirî mad û asyay biçûkda”. Belam Strabo aşkiratir nawzedyan dekat be “Çyanişînî seretayî xelkî welatî Mad, Ermenistan û herweha welatî Fars”.

Cige lem take rîzpere, gişt belge selmênekan amaje bewe deken ke kurd yekêke le mîlletanî Mad, wate ew boçûney profîsor Minorsky layengîryetî.

Min delêm ew tojeraney karyan Leser hevbendîy nêwan *kerduxî* û *kurtî* û hevbendîy ew dûwane legel nawî *kurd* kirdûwe, giştyan hawran Leser ewey *kurtî* berebabî kurdin belam Leser ew *kerdux* -ey Zênofon basyan dekat, boçûnî ciyawaz heye. Beşêkiyan baweryan waye ke hem *kerdux* û hem *kurtî* wêney here dêrînî wişey kurdin. Be boçûnî beşêkî dikeyan wişey *kerdux* hevbendî nawî *kurd* nîye.

Sir G. R. Driver^{xvii} yekêke le tojeranî corî yekem. Em hat û listêkî dîrûdirêjî tomar kird bew nawaney le kitêbe dêrînekanda hatûn û gutî em nawane rîşe nawî *kurd* -yan têdaye:⁶

- kerd – wu (- xî)
- kurt – î (- y)
- kurd – û (ênî)
- gord – y (- ên)
- gord – y (- êy)
- kurd – û (êna)
- qerd – û (siryani)

Driver hengawêkî berîntirîşî na û gutî:

Dûr nîye ew parçequrîne somerîyey ke degerêtewe bo hezarey sêyemî pêş zayîn û amaje be xakî “kerde” dekat, kontirîn şwêneward bêt derbarey kurd.

Delêm em parçequrîneye degerêtewe bo serdemî fermanrewayî Şursîn -î paşay Êr (1978-1970 BC). Ew naweş deşêt be *kerdeke* -yş bixwêndirêtewe (birwane Ignace, p38. HVR. and sub.) çunke ew bizwêney bedûway dengî didanekîda dêt le regî serbe gişt ew nawe kilasîkane, belay minewe girîngî û mebestî taybetyan heye. Ew bizwêne yan “î” ye yan “u” ke pêman waye le “eke” we firajî bûwe. Ca

⁶ Birwane nawî *kurd* le *Journal of the Royal Asiatic Society (Govarî Komeley Şahaney Asyawî)*, salî 1923.

eger hele nebim, ewa deşê wêney “kerd - dû”, “kurt - î”, “kurd - î”, “kord - û” herweha nawekanî dîke nêw listeke corêkin le firajîbûnî wişey “kerd - eke” y parçeQurîne somerîyeke.

“Xan-ek” şêwey bincîye bo wişey “beyt”. Em wişey le şêwezarekanî kirmancî jûrû, şêwezarekanî soranî û kirmaşanîda be “xan-î” hatûwe. Belam le şêwezari mukirî û Suleymanîda debête “xan-û”. Le şêwezari Sineda pêy degutirêt “xan-ig”. Em şêweyey dûwayîn piley dûweme le firajîbûnî wişeke le “xanek” ewe:

- “xan - ek”, “xan - g”, “xan - î”, “xan - û”

Detwanîn nimûney dîkey zor lem core bînînewe, be taybetî lewey peywestî rabirdûy tewaw (Present Perfect) -e. Amirazî “eke” paşgirêkî aşna û berçawî hîndo-êranîye ke le bincda hîndo-ewrûpîye.⁷

MacKenzie bo piştîwanî le girîmanekey xoy pitir penay birde ber belgey zimanewanî wek le belgey mêjûkird. Le rastîşda, be pejranî [î`tiraf] xoy, neytwanîyewe bo piştîwanî lew bîrokeye belge lew zeman û zemîne bînêtewe ke deşya zimanî kurdî têtayanda bertawî zimanî farsîy nêwerast bûbêt - wek xoy deygut – boye penay birdote ber belgey zimanewanî bo piştîwanî lew bîrokeye - ke naguncêt legel bawerî êmey delêyn kurdî emro newey mad-in.

MacKenzie wêray şarezayîyekî kem le kurdîda, pêşanî dedat ke *avêstayî* binemay şêwezarekanî kurdî. Aşkirayîşe ke zimanî madî zimanêkî serekîye le nêw ewaney pêyan delêyn zimanî bakûrî rojaway êranî. Zanayanî ziman begîştî hawran Leser ewey zimanî kurdîy hawçerx le rastîda yekêke le polî zimanekanî bakûrî rojaway êranî. Belay şarezayanî helkişîwî zimanî kurdîy hawçerxîş herdû zimane dêrîne arîyeke (kurdî û avêstayî) madîn.

Peçorîy wird bom deselmênêt ke belgekanî MacKenzie lewe nizimtirin bibine sepêner. MacKenzie dû xalî zaniraw le lay gişt şarezayanî zimane êranîyekan dekate belge bo tawî zimanî farsî Leser zimanî kurdî:

Xalî yekem birîtîye lew gorankarîye nakawey beser zimane êranî, kurdî û belûçîda hat be gorîni “y” -î feramoşkirawî destpêkî wişe be “c” -î êsta. Keçî şêwezari *goranî*, ke taybetmendîy zimane bakûrîyekanî heye, em gorankarîyey beserda nehatûwe. Ewca leber ewey ew gorankarîye beser zimanekanî kirmancî, belûçî û farsîda hatûwe kewate – be boçûnî MacKenzie – bêguman zimanî kurdî kewtote bertawî zimanî farsîy nêwerastewe.

Êmeş le MacKenzie depirsîn aye amadeye heman pêwer bekar bînêt bo zimanî *hewramî* û şêwezare êranîyekanî dîke bo geyştin be heman hokarî ew gorîney “y” be “c”?

Zimanî *goranî* ke goya ew denge feramoşkirawey parastûwe, le rastîda ewîş le yek le şêwezarekanîda – şêwezari girîngî *hewramî* - ew gorankarîyey beserda hatûwe: lewêda yek wişe ew gorankarîyey pêwe diyare, *cejin* -î hewramî, be farsî *ceşin* -e. Çend wişeyekî kemî dîkeş hen le hewramîda ew gorankarîyeyan beserda hatûwe, wek: *yame* ke dekatewe *şûşe* - cam -î êste. Herweha *yeven* (herzekar) bote *ciwan* [cewan] herweha wişe *yatû* êste bote *cadû*. Le farsîy konda wişey *yûvya* wate “el-mîrî” êste be hewramî bote *ciwa*.

⁷ Birwane: Tewfîq Wehbî, «*Essl Îsim Kerkûk*», govarî «*el-Kitab*», Bexdad, jmare 1, Sali 1, 1958, laperre 14.

Tenanet ger bişselmênîn wişe hewarmîyekan le farsîyewe xwazirabin – gerçî guncawtîre tenha wek şêwezari firajî bûbin – ewa heman lêkdanewe dest dedat bo şêwezari kirmancî û şêwezarekanî dîkeş, wate destpêkî wişe be “c” le birî “y” -î avêstayî. Legel eweşda le kirmancîda şwênawarî ew denge dêrîney “y” -m dozîwetewe, bo nimûne:

- *Ku, ku-ye, ku-yay* ke beranber *kuca* -y farsîye be watay kiwê.

Herweha le wişekanî:

- *Emê, -em-yay* û *ewê, ew-yay* ke beranber *în-ca* û *an-ca* -y farsîn, be watay êre û ewê.

Le layekî dîkewe, le kirmancîda *cê-yay* be watay *cêge* bekar dêt wek “cay” -î farsî. Belam hewramî heta êstaş le wişey *yage* -da “y” ekey parastûwe ke le kirmancîda *cêge* -ye.

Xalî dûwem ke MacKenzie derbarey şêwezari goranî deyurûjênêt birîtîye le gorankariyekî dîke le seretay wişeda, ewîş gorînî “hwe” -y kon be “w” -î êste. Be dîdî MacKenzie em gorankariye le goranî da amajeye bewey şêwezarekanî dîke le farsîyewe nêziktirin çünke le kurdî û farsîda em “hwe” gorawe be “xwe”.

Belam min pêwaniye em rêkewte hêndey lebar bêt bibête biryarder Leser bûnî hevberdîy taybet le nêwan kurdî û farsîda. Çünke nêzîkey gişt şêwezare êranîyekan, her le Pamîr -î bakûrî rojhelatewe heta Gîlan û Kurdistan le bakûrî rojawa be şêwezarekanî nawendî Êranîşewe, her wek farsî, em “hwe” y têyanda gorawe bo “xwe”. Rîzper lem bareda şêwezarekanî goranî, zaza û belûçîye. Tenha yek wişey heye le şêwezari lazgerdî -da ewîş wişey “wov” -e le “hvefne” -y avêstayîyewe hatûwe ke dekatewe “xew”.

Ewca gorînî “hwe” be “f” -î madî lêreda şî dekemewe:

MacKenzie bo ewey gumanî dîkeş bixate ser ewey kurdî zadey madîye, delêt:

Cêy serince ke yek taybetmendî heye le zimanî madîda ke le zimanî kurdîda nîye, ewîş taybetmendîy firajîbûnî “hwe” ye bo “f”.

Minîş delêm em taybetmendîyey “hwe - f” tenha le nawî “hverne” -y avêstayîda heye ke dekatewe nawî “ferne” -y madî be watey şiko û şikomendî. Bo yekem car em nawey “ferne” -y madî le tomarekanî Sergon -î şay aşûryan (722-705 BC) dozirawetewe ke derbarey hêrişkey salî 704 BC ye bo ser welatî “Letîyn” ke dekewte başûrî deryaçey Wirmê we. Le nêw ew serdaraney seraneyan da, serdarêkî mad bû be nawî “Ewr-pernu” (Aurparnu), em nawey têkbestey dû nawe: yekemyan “Ewre” ke nawî xudawendî mezin bû lay hexamenşî “Ewere - Mezda” û dekatewe “Xuday Jîr”, nawî dûwemîş “pernu”⁸ e, emîş derbirînêkî aşûryaneyê le wişey “ferne” be watay şiko û şikomendî. Em wişeyê le

⁸ Nawî yek le palewanekanî Hewlêre le sedey çiwaremî zayînîda, birîtîye le *Fer* û le *Ferne* -y Madî konewe wergîrawe. Em palewane be Qerdax naw debira. Le tomare aramîye mesîhîyekanda naweke *Guper-Eşinesp* bûwe, wate *Şikoy Eşine Esp - Perguşinesp - Per-Guşin-Esp* ewîş derbirînêkî aramîye bo nawe êranîyekey *Fer-Guşin-Esp* be watay *Şikoy-Guşin-Esp*. Nawî *Guşin-Esp* wate *ciwanû*. Emîş yekêke lew de cestandî [bercestebûn] -ey *Yezete* -y cengawer le berdem Zerdeşt -da pêyanda têperêt berew *Vret´rexne* -y avêstayî. Nawî *Vret´rexne* le pehlêwîda gorra be *Ferhran - Verhram - Vahram* û le farsîyê niwêşda bûwe *Behram* û le kurdîda bûwe *Baram* - ewîş nawî hesarey Mars (Merîx) -e.

nawî “Vînde - ferne” da heye û nawî yekêke le yaweranî “Daryûş” katêk kursîy fermanrewayî girtewe dest (salî 521 BC).

Le farsîy niwêda dû nawî hawwata hen: *xorre* û *ferre* (herdûk be rê-y gîr) be watay şiko. Wişey dûwemyan mîratêkî madîye. Le kurdîda wişey “*ferr*”⁹ man heye û “*xurre*” man nîye. Belam wişey “*wire*” man heye ke dekatewe rijdî, dilêrî û twanay giyanî û leweş deçêt firajîy wişey “*hurene*” y avêstayî bêt her wek ewey “*xurre*” -y farsîş bincî avêstayîye.

Naşêt ême çawerê bikeyn zimanî kurdî xesletêkî taybet biparêzêt tenanet ger rîzperîyekî degmenîş bêt û le gişt şêwezarekanî dîke xamoş bûbîtewe, farsî nebêt. Ew rîzperaneş le yek gundî nawçey Fars û le dû gundî biçûkî biyabanî nêwendî Êran be kirdewe hebûbin.

Lêreşda çend nimûneyek dexeyne rû nek bo piştîwanî le boçûnî xoman çunke pêwîstî pêy nîye, belkû bo firewandinî agadarî:

Nawçe heye le zimanî badînanîda (binzarêke le şêwezarekanî kirmancîy jûrû) le Kurdistan -î Îraq, xelk le birî *xarin* delên *farin*, wate *xwardin*. Hem hewramî û hem kirmancîy jûrû be *axur* delên *afer*. Le kirmancîy jêrûda wişey *fênk* heye le farsîda *xunuk* -î beranbere. Wişey dîkeş hen dengî “x” dekene “f”.

Kurdîy em serdeme wişey *fer* wek farsî bekar dehênêt. Le kurdîy rojaneda le şêwey têkbesteda dêt, rêk wek înglîzî... belam le şêwezarî mukirîda şêwey têkbestey “bed-fer” heye ke wişeyekî kurdîy hawçerxe beranber “duş-hverne” -y avêstayî be watay mirovî sûkî newî. Le kirmancîy nêwerastda debête “bêfer”.

MacKenzie bo pêşandanî pêgey zimanî kurdî be bawerî xoy pena debate ber hêlkarîyekî zanay zimannas Tedesco derbarey zimane êranîyekan û bo rûnkirdinewey hêlkarîyeke delêt:

Lêreşda wa pê deçêt zimanî kurdî dûr kewtbêtewe le zimanî madî, ger wirdbînewe le nawî pêtextî Mad debînîn yonanî kon delêt “Egbetane - Îkbetane” û farsîy kon delêt “He(n)gmetane”, herdûkiyan heman şêwezî “gme-te” yan têdaye, belam le kurdî şitî weha bûnî nîye.

Deba lem dû şêwaze wird bînewe. Le “*get*” û “*kimet*” -î avêstayîyewe, kurdî şêwezî “*aget*” -î parastûwe û le gerdanî karî “*hatin*” -da bekarî dehênêt. Belam le farsîda “*ameden*” beranber “*hatin*” e û şêwazekey dîkey “*egmet*” le gerdanda bekar dehênêt. MacKenzie eme dekate amajeyek goya zimanî kurdî besterî pitewî nîye be zimanî madîyewe çunke kurdî “*kimet*” bekar nahênêt belam farsî bekarî dehênêt. Keçî debînîn le rastîda kurdî core gerdanêkî karî heye ew şêwaze bekar dehênêt ke le bincda watay “*Hen-gmetane*” (Hemedan -î êste) dedat ewîş - le kirmancîy jûrûda – karî têperî *hîngavtin* û karî têneperî *hîngîvtin* -in. Le şêwezare kirmancîyekanî dîkeda têper: *engawtin* û têneper *engûtin*. Dûr nîye MacKenzie le *ferhengî Jaba*^{XVIII} (-y kurdî - fransî) da şêwezî jûrûy dî bêt. Belam Jaba le diyarîkirdinî bincî wişekeda dirustî nepêkawe, eweta nûsîwyetî bincî karî *hîngîvtin* heman rîşey karî *keftin* -î heye. Belay minewe aşkiraye ke bincî ew kare degerêtewe bo “*hengmemet*” be gorînî “m” bo “v” le kirmancîy jûrûda û bo “w” le şêwezarî dîkeda.

⁹ Gutarêkî dîke bilaw dekemewe tojînewey *Fer* têyda wirtir debêt.

Karî *engawtin* dekatewe *pêkanî amanc, pêkan*, wirttir bilêm: *kokirdinewe, têkgîrsan*. Le kirmancîy nêwendda wişey *pêkan* hawwatayetî. Em wişey niwêye lewe deçêt le “*pe-yek-dan* ewe hatibêt – be watay pîtekî debête *têkgîrsan* – belam mebest lêy *pêkanî amance*.

Herçî *engûtin - hîngîvtin* e karî tînepere û le kirmancîyda bawe û nêzîktirîşe le bincî *hengmet* ewe. Cêy serinc lêreda eweye – ewendey min bizanim - em kare û herweha şêwey tîperî wî (its causative) “*engawtin - hîngawtin*” ne le farsîda hen û ne le hewramîda. Belam *engawtin* le zimanî *fertî*^{xix} -da heye. Le *fertî* -da wişey *engewden* heye be watay *tewawkirdin*. Le kurdîda dû peyvî dîke hen her le *hengme* -we wergîrawen, ewanîş: “*akam*” û “*encame*” - ke debine amaje bo hevbendî letek şêwezarekanî bakûrî rojawa.

Dr. MacKenzie pêşniyazî xesletêkî dîkeş dekat bo nêzîkbûnewey kurdî le farsî û dûrkewtinewey le zimanî *fertî*. Ew xesleteş be boçûnî ew, birîtîye le bekarhênanî “*xistneser – îddafe/îzzafe*” le kurdî û farsîy nêwerastda û bekarnehênanî le zimanî *fertî* da.

Avêstayî em cênawe hem wek cênawî “*nîsbet*” bekar dehêna û hem bo “*xistneser*”. Belam le farsîy nêwerastda bekarhênanî wek *cênawî nîsbet* sinûrdar bû. Em zimane bo *cênawî nîsbet* pitir “*ke*” û hawcorekanî bekar dehêna. Le farsîy tazeşda “*i/y*” -î kon bo *cênawî nîsbet* bekar nayet, tenha bo *xistneser* -e.

Zimanî kurdî peyrewî avêstayî dekat û em amraze hem *cênawî nîsbet* û hem bo *xistneser* bekar dehênêt û lemeşda çî berpîrs nîye le bizîrbûnî amrazî *xistneser* le zimanî *fertî* -da. Eweta şêwezare kirmancîyekanî nêwçey Kirmaşan, Sine, Kerkûk û tenanet nêwçekanî Caf û Hewramî -yş amrazî *xistneser* wêl deken le paş nawêk ger be dengî awazedar kota bêt.

Ewca dr. MacKenzie pêy waye zimanî kurdî bertawî zimanî farsîye bewey serincî dawê ke “*dw*” -î seretay wişey degorêt be “*d*”.

Em serinceş bêcêye çünke em firajîye her wek farsî, zimanî “*belûçî*” yiş degirêtewe. Le her sê zimanekeşda em firajîye dû serçawey heye:

- 1- “*du-*” zimanî farsîy nêwerast
- 2- “*du-*” zimanî avêstayî niwêtir

Ca ger bilêyn “*d-*” y farsîy niwê le “*du-*” y farsîy nêwerastewe, hatûwe boçî “*d-*” y kurdî û belûçî le “*du-*” -y avêstayîyewe nebê? Kewate lem firajûtînedda, ne zimanî kurdî û ne zimanî belûçî, hîçyan bertawî zimanî farsîy nêwerast nîn. Bem boneyewe demhewêt guteyekî mamosta Tedesco bihênimewe yad ke deba zûtir basî bikem: “*Hemîşe derfet heye firajûtîni zimanewanî be şêwazêkî laterîb û cuda leyektir, bêne çerxan*”.

Mamosta Tedesco amaje dekat be wişey *şift* (wate *şîr*) le zimanî bakûrî rojawada ke beranberekey le başûrî rojawada *şîr* e û her em *şîr* -eye le zimanî kurdîda bekar dêt. MacKenzie hat û em serinceşey kirde destawêjêkî dîke bo ewey zimanî kurdî berête rîzî zimanî farsîy nêwerastewe. Belam tenha kirmancî û belûçî nîn wişey *şîr* bekar dênin, eweta gewharî û bacelanî -yiş bekarî dehênin ke şêwezari goranî-n û herweha şêwezarekanî nêwend, wek ferîzendî, netenizî, şehmîrzadî, gîlekeyî.

Em *şîr* e le osêti^{xx} -da be *şêwey exşîr* hatûwe ke nêzîktire le *xşîr* -î bincekey xoy ke le *muncî* -y serbe zimanî pamîr^{xxi} daye. Le layekî dîkewe wişey *şîr* le kirmancîy Kirmaşan -da be *şifte* -yş hatûwe. Legel eweşda, wişey *şîr* -î kurdî le farsîy niwêwe xwazirabêt yan na, ewa wişey *şift* le çend wişeyekî kirmancîyda her mawe, wek *şûtî* - *şiftî* û heweha *şiftecê* be watay jinî hemîşe zê.

MacKenzie dîsan hewil dedat zimanî kurdî le zimanî farsîy nêwerast nêzîk bixatewe û le destey bakûrî rojaway dûr bixatewe, denûsêt:

Lewe deçêt zimanî kurdîş wek zimanî farsî beşdar bêt le firajûtinî “t’r” y êranî kon bo “s”. Take nimûneş ke Tedesco be perêzewe deyhênêtewe – hokarî xoyişî heye – jimare “sê” y kurdîye. Belam dekirêt wişeyekî dîkeş bikeyne nimûne ke weha pê deçêt xwaziraw bêt çunke hawcorî nêzîkî xoy peyda nabin meger le şêwezarî “başkerdî” y serbe şêwezarekanî “mekran”, em wişey kurdîyeş “pêxwas – pêxawus” e û le “başkerdî” -da debête “pa-xwafs”. Le “goranî” -şda legel cudawazîyekî kem debête “pa-wîrwa” û le “zehraîye” da ger lêy wird bîtewe “pa-xerwa” û “pa-xarepa” dedozîtewe.

MacKenzie berdewam debêt û delêt:

Dr. I. Gershevitch^{xxii} - ke “başkerdî” dozîyewe- le ciwamêrîy xoyewe agadarî kirdim lewey dekirêt şwênpey gişt em corane helgîrêtewe be geranewe bo wişey avêstayî “xva - ewut’ re” be watay “hebûnî pêpoşî xoy” (having his own foot wear) bem core:

(Avêstayî) xv – (1) – ewut’ re – xwawsa – xwas (be kurdî) (x) (2) wau (h) re – wawîr – wîrwa (le goranîda). (pêwer: goranî, perê – herê (3), hrê < t’reyeh - û berewajbûne le kurdî nêwerastda “birwa” < “bawer”).

X (w) au (h) re > xawer – (+ pa) (le zehraîda). (pêwer: zehraî “xes” - (wate xew) > “xvefse”).

Min delêm firajûtinî “pê-xwas” û ... htd hênde aloz nîye, asantire:

Sereta seyrêkî şêwaze goranî yekey dekeyn “pa-wîrwa” - em wişeye awelnaw (rengdêr) î têkbesteye û lewe deçêt le “pa-wê-rwa” we helkişa bêt, be watay “kesêk Leser pêy xoy birwa” wate mirovî pêxawus.

Herweha wişey *pa-xerwa* -y “zehraî” lewe deçêt bigerêtewe bo serçawey *pa-xe-rwa* û heman watay zehraî-yekey dîkey heye: *pa-xe-repa* - le şêwe avêstayîyekeyda ke *rep* le birî *rew* -e ke hawwatay wişey goranîyekeye *pa-wê-rwa*. Ewca dêyne ser wişey kirmancîyekey *pê-xo-as* ke hawwatay wişey têkbestekanî serewen be “as” -î avêstayîyewe lebirî *rep* -î avêstayî. Lewaneyişe bincî gişt em şêwazane madî bêt.

Le helûmercî wehada naşêt karêkî dirust bêt ger bilêyn kurdî le gorînî “t’r” be “s” peyrewew farsîy kirdûwe. Her lem baseda delêyn jimare “sî” y hewramî her heman “s” -î farsîy heye.

Bem core MacKenzie berdewam debêt û peyvî dîke dekate belgey nêzîktirbûnî kurdî le farsîyewe wek le madî. Bo em mebesteş bincêkî xeyalkirdî dahênawe bo wişey *palawtin* -î kirmancî goya *pere-daweye* -ye, belam min pêwî waye bincî avêstayî heye şiyawtîre ewîş *epe-reêt’we* -ye ke le zimanî

“pazendî” başûrîda debête *parûden* û le pehlewîy sasanî û farsîda debête *paluden*. Wişey *palawtin* -î kirmancî *têperî hokarbîn* (causative) e. Belam weha pêdeçêt wişey *parzûn* -î kirmancî û *perzên* -î hewramî le *pey-rî-hriz* -î avêstayîyewe hatibin ke dekatewe *palawtinî wird*.

MacKenzie pêy waye kurdî, wek farsî, meylêkî heye bo gorînî *riz* be “l”. Lêreşda lîstêkî rîz kirdûwe bew “l” yey goya le farsî, kurdî û belûçîda hen û beranberyan *riz* e le bakûrî rojawada. MacKenzie delêt:

Cyawazîy kurdî û belûçî lem baseda nîşaneyê bo ewey xizimayetîy bince kurdîyêke legel zimanî farsîy nêwerastî başûr nêzîktir bûwe.

Belam hem kirmancî û hem belûçî, her nebêt le yek wişeda ke xwazirawey farsî nîye, wêkra *riz* -ekey degorin be “l”, ewîş wişey “sîphul - k” -î belûçîye ke le avêstayîda *spêbirzen* e û le kirmancîda *sipil* e ke zor nêzîke le *sîphul* -î belûçîyewe.

Gorînî “*riz*” be “l” merc nîye bibête belgey bertawbûnî başûrî rojawa. Nimûnekanî ew lîsteye le corî *sîpuriz* -î farsîy nêwerast (wate sipil), û *sipil* û *îsipul* le êranî nêwendda, le şêwezarî “gehwarî” da, le goranî û kaşanî -da tewaw diwestawî em girîmaneyen. Leweş bitirazêt *mil* -î hewramî le avêstayîda *miriz* e (wate: mil). Belam wişey farsî heye *riz* -î avêstayî parastûwe, wek *geriz* û *veriz* -î avêstayî ke le farsîda debine “geriz” û “weriz” û le kirmancîda debine “koruz” û “weriz”. Ewca “geriz” le farsî û kirmancîy nêwendda be *gile* -yş dête bekar hênan.

Pêşniyazêkî dîkey MacKenzie destey “*nd*” -î farsîye ke le kurdîda debine “*n*”. Le welamî em xaleda delêyn: dengî têkbestey “*nd*” le kirmancîy jûrû, le mukirî û herweha soranîda nemawe. Her yek lew dû denge be tenê dêne derbirîn û “*d*” nefewtawe. Legel eweşda çend wişeyekî zor kem hen le şêwezarî suleymanîda “*d*” û “*g*” yan le têkbestinî “*nd*” û “*ng*” da fewtandûwe, bo nimûne wişey wek *benî* (bendkirawe, bestiraw). Wişey *benî* le şêwezarî Sine da be watay *gîraw*, *zîndanî* dêt. Ewca le soranî, mukirî û suleymaneyîda *bendî* be zîndanî dêt, *hîndek*, *hendêk*, *henê* be watay *hendêk* dêt, *den* (deng) û *ban* (bang).

Le Suleymanîda car heye têkbestey *nd* û têkbestey *ng* têhelkêş dekirên û car heye cuda dekirênewe û be dengî takî cuda dêne derbirîn: *nd* be dengî lûtekî - didanekî û *ng* be dengî lûtekî - zarekî. Le layekî dîkeşewe dengî *nd* carûbar le Suleymanî û hemîşe le Kirmaşan û Sine debête “*n*”. Tenanet le hewramîşda *nd* heye debête “*n*”.¹⁰

¹⁰ Lêreda amaje dekem be tojîneweyekî wirdî xom - govarî *Gelawêj*, jimare 4, Bexdad, salî 1940, derbarey firajûtîni dengî «*d*» le zimanî kurdîda. Ewca salî 1960 bo dûwa car dîsanewe tojîneweyekî dîkem leser dengî «*d*» le şêwezarî Suleymanîda encam da. Em tojîneweyem be zimanî îngilîzîye û heta êsta bilaw nekirawetewe û lewaneyîşe her wek nûsyarêkî mêjûkird bimênêtewe û bilaw nekirêtewe. Le gutarêkimda ke taybet bo beşî yekemî, bergî yekemî *Govarî Korî Zanyarî Kurd* -im nûsîbû (1973), pêşniyazim kird ew dengey «*d* -î kilor» e la bidirêt çunke bote dengêkî coker û le jimareyekî zorî wişeda xoy deniwênêt. Em denge bote kospêkî sext bo têgeyîştinî zimanî edebîman û fêrbûnî le layen ew xelkey serbew hemû şêwezare zorey kurdîn.

Pirsyar lêreda emeye: aye kirmaşanî be taybetî û herweha hewramî ke “d” le têkbestey *nd* la deben, bertawî farsîn? Helbet welamekey nexêre! Debêt serincîş bideyne ewey *nd* tenha bo “n” nekwetûwe, ne le pehlewîy sasanîda (bepêçewaney farsîy nêwerast “manî”, “turfan”) û ne le farsîy niwêda.

Le kotaşda dêne ser ewey MacKenzie denûsêt:

Dûwa pêkhatinîş le nêwan kurdî û farsîda birîtiye le parastinî “fir-” -î seretay wişey keçî le zor şêwezari dîkey êranîy bakûrî rojawada debête “hr-” yan hawşêweyekî ewe. Herweha le belûçîda.

Belam le zimanî hewramîda ke “fir-” dekate “her-” - wek le wişey *hermene* (kar) da – debînîn denge bincîyeke “f” le serçawekeda parêzirawe: *fermaway* (ferman).

Goşenîgay dr. MacKenzie bewe dahêzira ka hat û nimûney le wişey kirmancî hênayewe têtanda dengî “f” -î bincîy “fir” degorêt be “h”. Bo nimûne wişey avêstayî *firaya* ke *awelnawî pêwerane* -ye (more) êste le Suleymanîda bote *here* (most) û letek awelnawda becardêt bo pêk hênanî *awelnawî berawirdkar* -î wek *here kurt*, herweha awelkar û amirazî karî avêstayî “fire - fira” be watay *lemewla - berew pêş* le kirmancîda bûne awelkar û awelnawî *fire* (zor) > *here* (zortir). *Fira* -y avêstayî debête “hera - ra” y kurdî, wek: *herakirdin – rakirdin, rakêşan, rabuwardin, rawestan*.

Ême deyselmênîn ke dr. MacKenzie wire û bawerêkî resenî nêw dozewe zimanewanîyekanî xoy dekate derawî boçûnekanî, belam peycorîy wird pêşanî dedat, ew pêşniyazaney ew pêşkeşî kirdûn bo dakokî le girîmaney xoy, bedaxewe nacorin. Wek lem tojîneweyeda basman kird, peycorîyekanî dr. MacKenzie bûne hoy pitewbûnî bîrûray baw. Ewendey ême êste bitwanîn biryarî têda bideyn eweye ke sengî belgekan hêz dedate ew layenî delêt zimanî kurdî beşêke le şêwezare êranîyekanî bakûrî rojawa.

Ême bawerî tewawiman heye bew bîrokeyey delêt zimanî kurdî zincîreyekî berdewame le zimane kurdîye arîye dêrînekan û le avêstayî - madî.

Le kotaşda gute zor girîngekey profîsor Minorsky dehênimewe yad û delêm lay min hîç hoyek nîye, wek ewey lay dr. MacKenzie hebû, bo destkarî yan larîbûn le gutekey Minorsky ke delêt: “*Şirovekirdinî yekbûnî mîlletî kurd debêt bibirêtewe ser binemay madbûnyan*”. Bigire bepêçewanewe, hemû hokarêkim heye bo piştîwanîy tewaw lem bîrokeye. Ger bişmewêt boçûnî xom be şêwazêkî dîke darêjim, delêm: “*Tenanet ger kurdî hîndo-êranî le bincda mad nebûbin, madî hîndo-êranî kurdî emron*”.

Lem tojîneweyeda cexitim Leser retkirdinewe û helweşandinewey ew boçûnane bûwe ke gumanyan dexiste ser hevbendîy kurd û mad. Belam le derfetêkî dîkeda belgey ayetî [erênî – pozetîv] dehênimewe Leser hevbendîy cêkwetûy nêwan zimanî *avêstayî madî* û zimanî *kurdî*. Le nêw belgekanîşda belgem debêt le serinc û dîvçûnî taybetî xom.

«...»

Perawêzekanî em terceme kurdîye

^I - Profîsor Vladimir Fedorovich Minorsky (1877–1966) [Mînorskî] mêtûnas, zimannas, rojhelatnas û kurdnasî nawdarî rûse. Mamostay zana, Kemal Mezher -î dîroknûs bem core bas le Minorsky dekat:

Minorsky nexşêkî direxşanî heye le rûnakkirdinewey gelêk layenî xamoşkirawî mêtûy gelî kurd, ewîş le rêy çendîn tojînewey bayexdarewe ke be zimanî corawcor nûsîwnî derbarey ew dîroke. Tiropkî tojînewekanî Minorsky birîtîye lew tojîneweyey basî kurd û Kurdistan dekat û be zimanî fransî bo “Zanyaristanî Îslamî” nûsîwe û salî 1927 bilawkirayewe. Birwane :

The Encyclopédie de l’Islam, vol. II, 1927, pp. 1196-1219, 1220-2.

(Paşan çapî înglîzî û almanîy Zanyaristanî Îslamî heman tojîneweyan bilaw kirdewe).

Layenî here girîngî em babete lewedaye Minorsky rîşey kurd debatewe ser mad û bem kareş serincî mêtûnûsanî tewaw rakêşa. Her bo nimûne delêm ger ew tojîneweyey Minorsky neba, dîroknûsî mezinî kurd, giyanişad Mihemed Emîn Zekî, xoy le dananî kitêbe nawdarekey «Xulasseyekî tarîxî kurd û Kurdistan» ne deda. Eweta xoy le dîbaçey kitêbekeda delêt: paş xwêndinewey ew tojîneweyey Minorsky demûdest biryarî da ((destpêşxerî bikat be nûsînewey «kurteyekî mêtûyî derbarey kurd û Kurdistan le serdemanî here dêrînewe heta êsta» ewîş leber roşinakî û leser binema û şêwazî em tojînewe bayexdare)).

Birwane: *Govarî Korî Zanyarî Kurd*, bergî yekem, beşî yekem, Bexdad 1973, yekem perawêz bo gutarî «*Kurd newey madekanin*», nûsînî Minorsky, terceme û perwaêznûsînî dr Kemal Mezher, lapere 552.

Mamosta Enwer Sultanî şeş gutarî helbijardey Minorsky tercemey kurdî kirdûwe û le kitêbî *Minorsky û kurd* -da salî 2006 bilawî kirdûnetewe, birwane: http://www.mukiryani.com/book_pro1.php?id=152

^{II}- Profîsor David Neil MacKenzie (1926-2001) zanaye le buwarî zimane êranîyekanda.

^{III}- Paul Tedesco tojînewey zanistaney heye têtîda bakûrî rojaway Êran be nîştîmanî *Avêsta* diyarî dekat.

^{IV} - SOAS, University of London (the School of Oriental and African Studies).

^V - Xenophon (c. 428-354 BC) [Zênofon] -î mêtûnûs û feylesûffî yonaniye û serbe xêzanêkî eristokratî Etên -e. Zênofon wek çete (cengawerêkî kirêgirte) beşdarî ew leşkire debêt ke Kuruş (Kurş) -î giçke şetekî dedat bo cengî dij be Erdeşîr -î şay hexamenşî û biragewrey xoy. Le şerî *Cunaxa* (Kunaksa) (401 BC) – î kenar rûbarî Firat û nêzîkey 70 kilyometir bakûrî Babil – da Kuruş dekujrêt. Paşan serleşkirî çetey yonanyanîş dête kuştin û ewca Zênofon zîrekane leşkirî yonan le Babil -ewe be Kurdistan û Ermenistan -da derbaz dekat bo kenarî deryay Reş. Zênofon em paşekişeyey be wirdekarîyekî zengînewe le *Anabasis* da tomar dekat. Lew berhemeyda Zênofon bas le welat û mîlletî Kardoxyan dekat.

Kuruş be dujminî Etên dadenira, em laynegîrîyey zênofon le Kuruş bûwe mayey dilgiranîy danîştwanî Etên lêtî û salanêkî zor şarbederyan kird.

^{VI} - Polybius mêtûnûsî nawdarî Yonan -î dêrîne, zadey Arcadia (Erkadya) mezîneşar (Megalopolis) -e le dewrûberî salî 200 BC û le dewrûberî 118 BC mirdûwe. Le cengî salî 168 BC da beranber Roman, Makedonya şikest dehênêt. Polybius debête yek lew hezar erîstokratey Erkadya ke salî 166 BC be dîl biran bo Roma û 17 sal lewê gir bû. Lew maweyeda Polybius şarezay karûbarî fermanrewayî Roman bû. *The Histories* şakarekey Polybius e û birîtîye le 40 kitêb, taybete be basî mêtûy împeratorîy Roman (salanî 264-146 BC) belam mêtûy giştîş beser dekatewe. Serçawe: *Nationalencyklopedin*: www.ne.se.

VII - Hesên Pîrnya (1871-1935) nawdar be Muşîr el-Dewle û xawen berhemî: *Tarîx Îran bastan*.

VIII - Seleukos II Kallinikos 246-225 BC nawzed be Pogon paşayekî selukiyan bû. Dewletî Selukî le ser destî Selukes-î yekem Seleucus I Nicator - paş mirdinî Eskenderî Makedonî û dabeşkirdinî welatanî jêrdestey Eskender le nêwan supasalarekanî leşkirekeyewe - hate dameziran (312-66 BC). Sereta pêtextî le Selukiya -y kenar Dîcile (Seleucia on the Tigris) bû (beranber şarî Tîsfun (Ctesiphon) -î paşan sasanîyekan kirdiyane pêtextî xoyan – Medaîn -î êstey Îraq), paşan dewrûberî salî 293 BC giwêzirayewe bo Antakiya (Antiochia) y kenar rûbarî Asî (Orontes) le Entakiyay Turkiya -y em serdeme. Împeratorîy Selukî le ewperî deselatîda zorbey welatanî nêwan Yonanistan, Mîsir û Hîndustan -î lejêr rikêfda bûwe.

IX - Împeratorîy Eşkanî / Erşakî / Fertî / Fertî / Partî (The Parthian / Arsacid Empire) (247/250 BC – 224/226 AD) cêy deselatî selukiyanî girtewe û paşan leser destî sasanîyekan deselatyan xamoş bû.

X - Dewletî Part, Fertî (Fertî) yan Eşkanî her yeke.

XI - Erdeşîrî Pabek (Ardşîr Babikan) (226-241) zayînî damezirêner û yekem şahinşahî dewletî Sasanî (225-651) - zayînî. Sasanîyekan heta şalawî erebî musulman fermanrewayîyan kird. Le cengî Qadsîye (637) û Nehawend (642) da sasanîyekan şikan û paşan dûwa şayan Yezdegird -î sêyem kujra û beweş dastanî ewanîş kota bû.

XII - *Karnamey Erdeşîrî Pabek (Kārnamag ī Ardaxšir ī Pābagān)*.

XIII - Mîlletî *gal* be İngilîzî *Gauls* yan *Gallic* û be latînî *Ga'Ilia* mîlletêk bûn le nawçey bakûrî Îtalya, Fransa û Beljîk dejiyan û serbe zimanî *seltîk / keltîk* -î ewrûpaye. Rewî xêlê keltîkekan berew başûr salî 390 BC geştiye Roma û dagîryan kird. Paşan le nêwan 284-222 BC le ast romekanda şikestyan hêna.

XIV - Rêjew: rew, rêçke.

XV - Rêjge: cêy rijanî çom û rûbar.

XVI - Strabo (Stra'Bon) (64/63 BC - ca 25) mêjûnûs û cîyografyanasî Yonanî dêrîne. Berheme mêjûyekanî fewtawin belam *Cîyografya* -key ke 17 berge parêzirawin. Astî zanistîy berhemekanî Strabo serûjêre, belam serinc û agadarî le geştekanî xoy tomar kirdûwe û herweha sûdî le berheme dêrînekanî ew deme wergirtûwe ke beşêkiyan êste nemawin. Wêray kemasî, *Cîyografya* -y Strabo berhemêke le nirixandin nayet.

Serçawe *Nationalencyklopedin (Zanyaristanî Swêdî)*: <http://www.ne.se>

XVII - Sir Godfrey Rolles Driver (1892–1975) rojhelatnasêkî İngilîze, tojînewey leser zimangeli samî û leser aşûryan kirdûwe. Bo tojînewekanî Driver derbarey kurd, birwane *Bulletin of the School of Oriental and African Studies*, bo nimûne:

- G. R. Driver, The Name Kurd and its Philological Connexions. Journal of the Royal Asiatic Society (New Series) / Volume 55 / Issue 03 / July 1923, pp 393-403.
<http://journals.cambridge.org/action/displayabstract?Frompage=online&aid=5769496&fulltexttype=RA&fileid=S0035869X00067605>
- The Dispersion of the Kurds in Ancient Times. Journal of the Royal Asiatic Society (New Series) / Volume 53 / Issue 04 / October 1921, pp 563 – 572.
<http://journals.cambridge.org/action/displayabstract?Frompage=online&aid=5702156&fulltexttype=RA&fileid=S0035869X00149305>
- G. R. Driver. The Religion of the Kurds. Bulletin of the School of Oriental and African Studies / Volume 2 / Issue 02 / February 1922, pp 197-213.
<http://journals.cambridge.org/action/displayabstract?Frompage=online&aid=3909896&fulltexttype=RA&fileid=S0041977X00102083>
- G. R. Driver. Studies in Kurdish History. Bulletin of the School of Oriental and African Studies / Volume 2 / Issue 03 / June 1922, pp 491-511.
<http://journals.cambridge.org/action/displayabstract?Frompage=online&aid=3909720&fulltexttype=RA&fileid=S0041977X00102344>

^{xviii} - Rojhelatnasî nawdar Alexandre Jaba (1803-1894). Jaba û mela Mehmûdî Bazîdî (bayezîdî) (1797-1859), wêkra le salanî (1858-1859) da yekem ferhengê kurdî – fransî û fransî – kurdî – yan danawe. Jaba be hawkarîy Bazîdî çendîn destînûs û serçawey şakarî kurdîy girîngiyan le fewtan parastuwe, yek lewan ew destînûsey *Şerefname* -ye ke Bazîdî her lew salaneda le farsîyewe tercemey kurdî kirdûwe.

^{xix} - Zimanî fertî /fert'î = partî, eşkanî, pehlewî eşkanî, pehlewî partî, pehlewî -y bakûrî rojawa. Bo rûnkirdinewey xiştey zimangeli êranî birwane em xişteyey xwarewe:

Zimangeli...	êranîy dêrîn	êranîy nêwerast	êranîy niwê
Bakûrî rojawa	madî	partî (fertî/fert'î = pehlewî eşkanî)	kurdî, belûçî
	avêstayî		
Bakûrî rojhelat	sekayî	alanî, xewarzimî, suxdî	osêtî, yexnabî
Başûrî rojhelat	- - -	sakî û baxterî (belxî efxanistan)	peştû, pamîrî
Başûrî rojawa	farsîy kon	farsîy nêwerast (parsî=pehlewîy sasanî)	farsîy niwê (parsî, darî, tacîkî)
Serçawe: <i>Nationalencyklopedin (zanyaristanî swêdî)</i> http://www.ne.se/lang/iranska-språk			

^{xx} - Zimanî osêtî (*ossetie*) yekêke le zimangeli êranîy niwê û serbe destey bakûrî rojhelate. Osêtî le nawçey Kewkas (*Qewqas*) birewî heye.

^{xxi} Zimanî pamîr yekêke le zimangeli êranîy niwêy serbe destey başûrî rojhelat.

^{xxii} - Ilya Gershevitch (1914-2001) êrannasêkî nawdare, xawen çendîn tojîneweye derbarey zimanî başgerdî (Kirman, Sîstan û Belûçistan), suxdî, avêstayî û herweha zerdeştayetî.

«...»